Nêrînek derbarê xebata gelê Kurd li Tirkiyê

Ferîdûn Yazar
10/2/2007

Di destpêkê de, dixwazim bidim zanîn ku min şaredariya bajarê Ruhayê ê berê kir, û di sala 1992an serokatiya Partiya Keda Gel (HEP) kir, dema ku vê dawiyê DTP ê li Tirkiyê hate damizerandin, di wê de xebata xwe berdewam kir.Anuha, min û hevalan, komeleyek daye çêkirinê bi navê Forma Demokrasiya Kurdî.Navenda wê li Enqere ye.Forma Kurdî di warên neteweyî, kultur û hunera Kurdî de dixebite.

Ez parêzer im, min bawernameya xwe ya fakulteya Hiquq li Istenbolê sitand, piştre sala 1971 komeleyeke Kurdî bi navê DDKO li Diyarbekirê dema ihtîlala eskerî bû, çiqas Kurdên xwendevana hebûn, tev komirin û girtin, du sal hepisê eskerî raketin peyre sala 1977an, li bajarê Ruhayê, min şaredariya bajêrkir heta 12ê Îlonê dema cûnta eskerî û dîsa Kurd hatine girtin, ez jî di nav de, li zindana Diyarbekirê, sitema ku li Diyarbekirê li Kurdan hate kirinê belkî Hîtler li Cihûyan nekiriye. Salekê di hucrê de mam û sala 1977an, dema ez şaredarê Ruhayê bûm, sûîqastek, ji aliyê polîs û şovonîstên Tirkan li min çêbû, her weha min çar operasyonên dinê derbas kirin, zarokên min jî bi min re birîndar bûn, dîsa jî me xwe ji doza gelê xwe neda paş. Dîroka Kurdan gelek dûr û dirêj e.Dema epmeratoriya Osmanî hilweşiya û Dewleta Tirkiyê hate çêkirin, û sînorên wê bi peymana Lozanê hatine çesipandin heta hingê Ataturk digot:Kurd û Tirk bira ne, weke hev in û mafê herdû milletan di Tirkiyê de wekehev e.Di sala 1922an de, Ataturk yasayek pêşkêşî parlementoya Tirkiyê kir ji bo otonomiya gelê Kurd lê ew yasa qet di parlemento de nehate rojevê û guftûgo û nîqaş serê pêk nehat, meqseda Ataturk heta sala 1923an, peymana Lozanê îmze bibe, Kurdan bixapîne, siyasetek rast bû û Kurdên me wê demê bi sozên Ataturk hatine xapandin.Şerîf Paşa nûnerê Kurdan bû di peymana Lozanê de, lê axa û begên Kurdan digotin Ismet Inunu nûnerê me ye ne Şerîf Paşa!!Şerîf Paşa ji kongirê derxistin Ismet Inuno kete şûna wî, weke nûnerê Kurd û Tirkan.Piştre Ataturk destûr çêkir sala 1924an, got ku kî li Tirkiyê heye Tirk e !Peyre serhildana Şêx Se`îd çêbû, û ew û hevalên xwe hatine bidarvekirin, piştî 3 salan serhildana Agirî destpêkir, ewjî têkçû û sala 1937an serhildana Dêrsimê çêbû, dema ku 200,000 Kurd hatine kuştin û çemê Dersîmê ji xwîna Kurdan sor diherikî.Peyre, asîmîlasyonê destpêkir.Li her derê, kampaniyaya (Tirkkirinê) dihate meşandinê tanî sala 1960î, dema cûnteke eskerî qewimî û gelek Kurd hatine girtin û îşkenecekirin.Sala 1964an, li Stembolê di zanîngehê de, me nikaribû bigota em Kurd in, me digot em xelkê rojhilat in angu rojhilatê Tirkiyê.Peyre, Partiya Karkerên Tirkiyê derket, Kurdan alîkariya wê kirin.

Sala 1959an, li Kerkûkê xeberek derket gotin ku kurdan li Kerkûkê Tirkmen qetilkirine. Parlementerê Tirk bi navê

Asim Înen bû di parlementoyê de axivî û got li Kerkûkê , Kurd çiqas Tirkmen qetilkirine, em jî li Tirkiyê ewqas Kurdan qetil bikin!ji ber vê çendê, xwendevanên Kurdan li hev civiyan û telegrafek ji serokomar û serokwezîr û rayedarên dinê yên dewletê re şandin gotin ku em vê protesto dikin û eger hunê Kurdan bikujin werin pêşî me bikujin, 49 mirov girtin destgîr kirin, ew di dîroka bakurê Kurdistanê de, navê meseleya 19 mirovan li xwe digire.
Sala 1968an, em xwendevanên Kurd li hev civiyan, me sala 69an DDKO çêkir ya ku di sala 1971 ê de, bi destê cûntan hate girtin.Wekî din, hêdî hêdî rêxistin û partiyên Kurdî hatin avakirin lê DDKO yekemîn komele Kurdî bû, ewjî hate girtin, piştre, di sala 1978an de, şaredarê bajarê Ruhayê bûm, PKK ê li Ruhayê derket û dest bi tevgera xwe kir, pir kin ajot, di sala 1980î de, cûnta eskerî hat hereket girtin.Sitema ku li zindana Diyarbekirê hate kirin, hişt ku fîrarî û yên dinê biçin çiya, û dema ku xelkê zulma ku li hepisê bûyî bihîst kes li gund û bajaran neman tev çûn serê çiya û PKK ê li serê çiya bi çekdarî bipêşde çû.Sala 1984an, dema ku ez ji zindanê derketim Torgut Ozal bûbû serokwezîr û piraniya Kurdan tevlî partiya sosyal-demoqrat (CHP) ê bûn û têde 3 hizrên cida cida hebûne: sosyalist û `Elewî û Kurd.Di sala 1987an de, bîst parlementer ên Kurd yên welatparêz ketin parlementoyê de.Di sala 1989an de, li Parîsê instûta Kurdî Konferansekî neteweyî Kurdî lidarxist û heft parlementerên me çûn wê bê ku xeber bidin, dema hatin partiyê ew her heft ji partiyê bidûrkirin, ji ber vê çendê me tevan ji partiyê îstîfa kir.Kurd û `Ewleî û çepên rastî jê veqetiyan, tenê ma şovonîstên Tirk , anuha Denîz Baykal, serokê wê ye.Bi fikrê xwe ji Be`es pir nêzîk e, weke nimûne dema Sedam Husên hate bidarvekirinê, CHP ê nerazîbûna xwe nîşan da!!.
Di sala 1990 î de, me Partiya Keda Gel (HEP) çêkir, ji sala 1991ê de, di hilbijartinan de, 20 parlementer ketin parlementoyê de, Leyla Zana û hevalên xwe.Di sala 1991 û 1992 an de, min serokatiya partiya Keda Gel kir, piştre ew parlementer tev hatine girtin û min parêzeriya wan kir.
Di qonaxa îroyîn de, li Tirkiyê, Yekîtiya Ewropayê(YE) dixwaze Tirkiyê li gor şertû merc û kirîterên xwe bibe endama wê, lê Tirkiyê jî dixwaze li gor xwe bibe endama Yekîtiya Ewropayê!.Goftûgo berdewam in.Pirsa Kurdî li Tirkiyê îro li her derê tê gotin ji aliyê hikûmet û rayedarên mezin yên dewletê weke serokwezîr Receb Teyb Erdoxan yê ku berî sê mehan got ku pirsa Kurdî li Tirkiyê heye lê leşkeran ev nepijirand û gotin ku ti mesele li Tirkiyê bi navê meseleya Kurdî nîn e!
Li Tirkiyê bi pêşveçûna siyasetê re anuha 3 partiyên Kurdî hene DTP, KDP bi serokatiya Şerefedîn Elçî, HakPar bi serokatiya Sertaş Bucak.Hakpar çareseriya federasiyon ji pirsgirêka Kurdî di Tirkiyê de pêşniyaz dike.Her weha, Şerefedîn Elçî jî vê çareseriyê pêşkêş dike.prgorama wan wisa ye.DTP ê ji aliyê xwe ve dibêje ku dema Tirkiyê bibe welatek anjî komareke demokratîk pirsa kurdî çareser dibe.
Bê guman, serpêhatiya kurdistana/Iraqê pirsa Kurdî li Tirkiyê bipêşve bir.Başûr hêz û piştgiriyê da Kurdên bakur û daxwaza azadiyê li nik wan geştir û xurttir kir.Di qonaxa niha de, pêwîst e Kurdên hersê parçeyên Kurdistanê û yên seranserê cîhanê ezmûna Kurdistana/Iraqê biparêzin.Li milê din, divê ku hikûmeta herêma Kurdistanê

balanseke –tevî ku dijwar e jî-di navbera berjewendiya milletê Kurd li parçên din û hikûmetên serdest de, pêkbîne.Her weha, divê siyaseta Kurdî li hersê parçeyên din"Sûriyê, Tirkiyê û Îranê"zirerê negihîne başûrê Kurdistanê.Di baweriya min de divê ko Komîteyeke neteweyî bilind were damizerandinê.Di heman çarçoveyê de, ez avakirina Lobiyekî Kurdî pêwîst dibînim, pêwîst e lobîyekî Kurdî were çêkirinê.

Rewşa gelê Kurd bi giştî ne baş e.Dijmin pir in.Her çar aliyên me dijmin in.Tirkiyê anuha pirsa Kerkûkê gelek giring û mezin dike.Leşkerên Tirk dibêjin ku em têkevin Kerkûkê û Qendîlê bombebaran bikin.Lê, nerazîbûn di hundirê Trikiyê bi xwe de jî, derbarê maytêkirina Tirkiyê di karûbarên Iraqê de zêde dibe û bêtir çareseriyên siyasî dadikevin holê .Koordînatorê PKK ê, general Edîb Başer berî çend rojan di çapemeniya Tirkiyê de kak Mesûd Barzanî serokê herêma Kurdistanê û mam Celal Talebanî serokomarê Iraqê weke "serokeşîr" li qelem dan!Lêbelê, dîsa digot ku divê em bi wan re danûsitendinê bikin û têkiliyan ava bikin.Angu, ew jî êdî têdigihin ku ew pirs bi şer nayête çarerserkirin.Pêwîst e em jî ji aliyê xwe ve, Lobiyekî Kurdî ava bikin, avakirina Lobiyekî Kurdî li Tirkiyê dikare bibe alîkar ji bo başkirina têkiliyan di navbera Kurdistana/Iraqê û Tirkiyê de.

Rewşa Kurda yekîtiyê ferz dike .Bi hevre eleqeçêkirin, bi hev re hereketkirin, bi hev re tevgerkirin, kîjan dewletê de Kurd hene meşandina siyaseteke taybet di gel hebûna siyaseteke neteweyî giştî. Di Tirkiyê de, gelek pirsgirêkên mezin hene.Dawiya payîzê hilbijartinên parlementoyê hene, pirsa yekîtiya Ewropayê (YE) heye, meseleya Kurdistana/Iraqê heye, pirsa Kerkûkê heye, pirsa PKK ê heye.Ji ber vê çendê, stûbariya Kurdistana/Iraqê gelek mezin û giran e, siyaset û dîplomasiyeke wisa were kirinê ku bi her çar parçeyan re eleqedar be û zirerê negihîne wan, û ewjî zirerê negihînin başûr.Derbarê hilbijartinan jî, tiştek anuha ne diyar e.Di vê derbarê de, Forma Demokrasiya Kurd konferansekî netewî vê payîzê li Enqere sazkir.Şerefedîn Elçî, HakPar, Îsamil Beşekçî rewşenbîr û sosyologê Tirk dostê gelê Kurd amade bû, DTP ê pêşî wê amade bûna, paşê nehatin konferansê.Armanca xebata me di Forma Demokrasiya Kurd pêkanîna yekîtiya gelê Kurd e.

Li Tirkiyê anuha, ne mumkin e pirsa Kurd bi şer û çekdarî were çareserkirinê.Dev ji çekdariyê lazim e êdî were berdan.Sala 2007an, ji bo Kurdan hemiyan here giring e .Yekîtiya netewî pêwîst e, tevî damizerandina komîteyeke netewî ji ber ku azadî û serkeftina Kurdan di yekîtiya wan de ye!